Australian Government | ParentsNext

Rapora pêşektina te

Dema beşdariya di ParentsNext'ê da, renge pêwîst be ku derbarê çalakiyên xwe şirove bikî.

Şêwirmendê ParentsNext'ê dê ji te ra bibêje ku çi rojan û çi tiştan ragihînî.

Dê ji te were xwestin **raporeke ciyawaz û cuda ji ParentsNext û Centrelink'ê ra raber bikî** – tu dikarî bi riya telefonê an online rapora xwe bidî.

Dayîna raporê bi awayê online

Tu dikarî bi riya malpera **myGov** an bernameya telefona destan a **Express Plus Centrelink** rapora xwe raber **Centrelink** bikî. Tu dikarî bin riya bernameya **Job Seeker** rapora xwe bidî **ParentsNext**.

Heke te jibo çêkirina hesabeke myGov an lînkkirina bernameya li hesaba myGov'a xwe hewcetî bi alîkariyê hebe, şêwirmend dê bikare alîkariya te bike.

Dayîna raporê bo Centrelink'ê

Derhata xwe ragihîne û **piştrast bike ku te** pêwîstiyên plana xwe dabîn kirine.

Dêbavên ParentsNext'ê

Piştrast bike ku tu di çalakiyên plana xwe ya beşdariyê da beşdar bûyî.

Hin xal jibo ragihandina çalakiyê di ParentsNext'ê da

Heke nikarî bi awayê serxet û online ragihînî, tu dikarî di roja rapora xwe da tev şêwirmendê xwe bikevî têkiliyê û ew dê alîkariya te di amadekirina raporê da bikin.

Tu dikarî jibo wergirtina Bibîrxistinê bi riya kurtepeyamê (SMS), ji riya bernameya **Job Seeker** an bi riya Email'ê navê xwe tomar bikî. Jibo wergirtina lêzanînên zêdetir ji şêwirmendê xwe bipirse.

Tu dikarî sozên xwe yên malbatî li rojhejmêra heyî di bernameya **Job Seeker'ê** da zêde bikî an ji şêwirmendê xwe ra bibêjî, ser vê esasê ew dê bikarin hin çalakiyan li gorî jiyana te ya malbatî organîze bikin.

Girîng

Jibo dewama wergirtina pereyê perwerdekirina zarokan (Parenting Payment), girîng e ku di rojên diyarkirî ji aliyê şêwirmendê xwe va rapora xwe ragihînî. Heke vî karî nekî, renge bikevî bin bandorê.

Heke bûyerek qewimî û te nekarî di wê rojê da ragihînî, di dema herî lez da ji şêwirmendê xwe ra ragihîne da ku pêşî li bandorkirina ser pereyê ku werdigirî were girtin. Her wiha renge pêwîst be ku digel Centrelink'ê biaxivî.

Jibo wergirtina lêzanînên zêdetir seredana vê adresê bike dese.gov.au/parentsnext